
# ÎSOT

KOVARA WE JI DU MEHAN CAREK DERTÊ

## OLOF PALME HAT QETL KIRIN



4

1986

www.arsivakurdi.org



# PÊŞNIYARÎ

Li Ewrupa bi kêmasî nezîkê 20-30 grub an partî ên kurda hene. Vana li gor quwet û giraniya xwe kovar pirtûk an belavokan çap dikin. Her yek bi malzeme û xebata xwe, mehê nezî 10 000 kron li vî karî mesref dike. Ev kar gişt bê şik jibo pêsveçûna milîtana û gelê meyî bindest e. Lê çi feyde ev kar û xebat nagihîje Kurdîstanê wek dilê van partî û gruban dixwazin. Sebeb jî wek hûn dizanin, li Kurdîstanê îmkan tûnene. Bi hawakî din şoreşgerên profesyonel tûnene ku vî karî bimeşînin.

Belê, yanî rasterast pere tûneye ku vana karê şoreşgerî bidomînin.



Me (Kovara ÎSOT) hesabekî pir bi qurnazî çêkir. Ewê cara pêşîn be emê xizmetek qenc ji partî û grubên xwe yên Kurdîstanî re bikin. Gerek ew her dem vê xizmeta me bînin bîra xwe.

Xizmet ev e:

Van 20-30, na na em bêjin 20 partî an grubên me yên Kurdîstanî ji dêvla kovar an belavok çapkirinê her meh 10 000 kronê xwe bişînin Kurdîstanê (Jibo xebata şoreşgerên profesyonel) bi tevayî dike zêdeyî 200 000 kron. Ev bi perê Tirk neziki 17 milyonî ye. Mehê 17 milyon kare nêzîkî 600-700 kesê profesyonel bê derd û kul xudî bike û hewceyî kesî neke.

Ev 600-700 kesên profesyonel li Kurdîstanê bi xebat û propaganda xwe wê ji van kovar û belavokên Ewrupayê çêtir kar bikin. Koro ji xwedê çavek dixwest, a ji were du çavên belaş.

Me rêyek baş da ber we, ne wusa? Em bi xwe zanin baş e. Ji hawakî ve pir û pir baş e. ÎSOT ne kovareka siyasî ye. Ji ber vê yekê wê karê xwe yî weşandinê her bidomîne.

Bi kêmasiya kovar û belavokên siyasî emê karibin daha zêde ÎSOT a bifroşin we xwendevana û partî ên meyî siyasî.

Bi vî hawî emê ji zerara xwe, hûnê jî ji stendina kovarên partî û gruban xelas bibin.

Haydê em û hun tevda di xweşiyê de bimînin.


ÎSOT

www.arsivakurd.org


XWEDÎ : KOMELA YEKITIYA KARKERÊN DEMOQRATÊN KURDÎSTAN
BERPIRSIYAR Û REDAKTOR : MAMOSTE
NAVNÎŞAN : AXBYPLAN 5 163 73 SPÅNGA
TFN: 08/760 81 23 POSTGÎRO: 496 09 75-6
BUHAYE WÊ : 10 Skr, 10 Ff, 3 DM. ABONA SALEKÎ 70 Skr
ISSN: 0283-099X
© Mamoste




www.arsivakurdi.org


"TIŞT, JI ÎSOTÊ JÎ TUJTIR HENE"
gazetede bir haber: Ankara'dan İstanbul'a gelmekte olan tirenin bir kompartımanında yolculardan biri, portakalı orak-çekiç biçiminde soyduğu için kompartımandaki başka bir yolcu tarafından ihbar edilerek Eskişehir'de tirenden indirilmiş ve yapılan sorgusu sonunda tutuklanarak cezaevine gönderilmiştir.
İnanılacak gibi değil ama, gerçek... Portakalı eliyle orak-çekiç biçiminde soyuyor diye bir adam tutuklandı. Bir portakalın, nasıl orak-çekiç biçiminde


JI ROJNAMAN:
CUNTA HEQ DA SEROKÊN PARTIYÊN SIYASÎ ÊN KEVN, JIBO AXAFTINÊ...
DEMIREL
XWE RE REHET
XWE RUNIŞTIBU
DERKEVIM SER
MEYDANA ÇI, JI XELQ
BIBÊJIM.
EZ JI QANUN



1986'AN DE WAZÎFÊN ME Û PARTÎZANÊN ME ÊN KU XELAT STENDINE
WEK DI PROGRAMA ME DE JÎ XUYA DIKE, EMÊ ÎSAL 3 CIVÎNA ÇÊKIN. DI VAN CIVÎNAN DE JIBO YEKÎTÎ BI PARTIYAN RE, WÊ 6 HEB ENDAMÊN ME LÊXISTIN BUXIN. JIBO ŞEV Û MITÎNGAN JÎ ME LÊXISTINA 14 HEBA DAYE BERÇAVAN.
BÊJE EMÊ BI CEMAETA FATÊ RE YEKÎTÎ ÇÊKIN!
BI CEMAETA ŞEMDÎN'RE YEKÎTÎ, BÊJE ERÊÊ! BINÊ DIŞKÎNIM HA..
ME DI 1986'AN DE YEKÎTIYEK DAYE BERGAVÊ XWE KU GÊBIBE GEREK DU PARTÎ ÎLHAQÎ ME BIBIN. EW ÇAX MEWCUDA ME HIMA, HIMA ZÊDEYÎ 26 HEBA DIBE.. LI GELÊ ME PÎROZ BE
ERÊÊÊÊ.. ERÊÊ... EYŞÊ, FATÊ, ŞEMDÎN, MEMDÎN, GIŞ ERÊÊÊ...
XELAT GIRTIYÊ ÎSAL
JIBO ZÊDEKIRINA SEMPATÎZANAN GRUBÊN ME XELATÊN MODERN BELAV DIKIN.
JINIK, TU DIBEJÎ EM JI KÎJAN GRUBÊ RE SEMPATÎZAN BIKIN?
EZ DIBÊJIM BIRA GRUBA MÎRKUT BE... TU ZANÎ KU MIRKUTÊ MEYÎ MALÊ ŞIKIYAYE.

# mızgînıya kumıkan

AMS LI Stockholmê kursa kumikan vedike. AMS îsal rîcayen partî û komelên kurd da berçava û jibo xatirê wan kursek vekir. Heta nûha ji komele û grubên kurdan 176 kes mureceatî vê kursê kirine.

Ên heta nûha ji ruyen kumika ni karibûn kovarên xweyên kurdî derxin ji kefa didin lotika.Wek hun ji dizanin kovara SÎPAN'ê ev 13 meh e ji tûnebuna kumika çap nabe û nagihîje destê xwendevanan. Berpirsiyarê SÎPAN'ê belavokek belavkir. Têde wûha dibêje:

"
JI GELÊ MEYÎ QEHREMAN RE

Cunta faşîst a nîjadperest bi sed salan e welatê me talan kiriye, zimanê me xistiye bindest û kumikê me qedexe kiriye. Em îro nikarin li Kurdîstanê kumikxana vekin.

Bi azadî û dilşadî pirtûk û nivîsen xwe bi kumikên xwe bixemilînin.


Îro me vê çerxê bi saya serê AMS'ê hinek bi alî xwe ve zivirand. Em pir kêfxweş û dilşadin bi çêbûna kursa kumikan. Me (wek kovarek şoreşger) dixwest peşiya vê kurse karê kumikan hal bikirana. Jibo viya me 3 kes şand Alemaniya, 2 kes ji Fransa. Bi Holanda û Îngîlstanê re jî axaftina telefonê hat çêkirin.Lê mixabin tu bersivekî esasî neket destê me. Herçiqas hevalê me yî Alemaniyayê nêzîkayî lêkirin jî, lê çi feyde wiyê ku wê ji me re kumika çêkirana (Kurê kur xaltîka hevalê me yî ku di qomîta bajarê Hamburg'de ye), vegeriyaye Tirkiyê û vê firseta mezin ji destê me çû. Lê tucarî me xwe sist nekir û çavê xwe jî ne tirsand. Wek hun ji dizanin me jibo kumikan qampanyek li bajarê Stockholm û Uppsalayê vekir. Di qampanyê de bi dehan îmze hatin berevkirin. Ji xwe ev kursa AMS'ê bi xêra van îmzan û xebata me ya xîretkar e. Em tenê bi vê jî nesekinîne. Ev tişt di programa me de wûha cî digre."Madde 16- Bi serketina şoreşa millî a demoqratik wê li her bajarên Kurdîstanê berî her tiştî 2 heb kumikxane bên avakirin: Yek a gelerî jibo pale û gundiyan, a din jî jibo endamên me û xebatkaran".


_Kursên kumikân ji gelê meyî bindest re pîroz be!..
_Ji kumika re azadî!..


_Her bijî kum û Kurdîstan!..
"

Belavok pir di cî de ye. Lê belam qala "i"yên bi kumik û en bê kumik nake. Ev tiştek pir giring û kêmasiyek mezin e. Ji ber vê yekê em rexne li van hevalan digrin û emê heta dawiyê, ji rexnegiriya xwe paş da nemînin.Em daxwazkarin ku wê ev muşkula mezin jî, di nav partî û grubên Kurdîstanî de piştî şoreşa Kurdistanê bi hawakî rewşenbirî bê halkirin.

ISOT







## KONGERA FEDERASYONA KOMELÊN KURDÎSTAN

Di meha nîsanê de kongera Federasyona Komelên Kurdîstan li Stockholmê hate çêkirin. Tê de pir pêşniyar hatin dayin û biryar hatin qebulkirin. Hinek xwendevan dixwazin bi van biryara bihesin, lê em eşkere nakin. Biryarê me bixwe jî wek mene.
Lê emê viya tenê bêjin ku Dîvan ji Upsalayê, nuner ji AMS'ê, îdeolojî ji partiyan û xebat ji mervên serbuxwe pêk hat.




www.arsivakurdi.org


KU ŞEŞÛBÊŞ WERE EMÊ BI PARTIYA REWŞOYÊ CILTÎNÎRE YEKÎTIYÊ ÇÊKIN.
YA BAŞ KU NEYÊ... WÊ WEXTÊ EMÊ BIBIN PARTIYEK SERBIXWE.
DARA YE
EZ BI MÊREK YEKÎTIYÊ DIXW XWEDÊ TU QEB AMÎN....
EZÊ PARTIYEKÊ JIBO SERSALA XWE BIDIM. O HIQ..
DERS Û TALÎMA YEKÎTIYÊ
BIJI KURD
YENI RAKI
LENIN
MARX
MIN GOT YEKÎTÎ, WAN GOT ÎLHAQ... DAWÎ BI XÊR BE.
SEROK, JIBO YEKÎTIYÊ EM LI HEVÎYA FALA TENE


CARNA JÎ YEKÎTÎ DI NAV PARTIYÊ DE LI HEMBER MUXALEFETÊ..
IM CIM TÛNE YE!..
EMÊ WAN TÊXIN GRUBA XWE.
EMÊ WAN TÊXIN GRUBA XWE
QONFERENS JIBO YEKÎTÎ DI NAV GRUBAN DE!...
NE BIRÊ MIN, NE JÎ TU XUŞKÊ MIN HENE. JI MALA ME EZ YEK BI TENÊ ME. DI PARTÎ-YÊ DE DÎSA EZ YEK TENÊ ME. MA HEWCE YE EZ YEKÎTIYÊ ÇÊKIM? JI XWE PARTIYA MIN BEST MIN E.
KURDISTANEK YEKGIRTÎ DIXWAZIM.
PARTÎYA YEKBIXWE
BIJÎ SORES P.Y.
LI MALA YEKÎ SERBIXWE
DEQÎQA DAWÎ
PARTIYA ZIRTÊN (BI NAVÊ) SOSYALIST Û GRUBA CEBARÊ EWÎNÎ CIVÎNA KU DI NAVHEVDU DE LI SER YEKÎTÎ-YÊ ÇÊKIRIN BI QEHREMANÎ DERBAS BU. TENÊ 2 POZ ŞIKÎYAN, 3 ÇAV BERDERKETIN Û HINEK MILÛLING BER-TERAF BÛN. BI KÊMASÎ NÊZÎKÊ 6 LÎTER XWUN HAT RIJANDIN. EV DI RÎYA SERKETINA AZADIYA GELÊ ME DE SERFIRAZIYEK GIRING E. LI GELÊ ME, LI PARTIYA ZIRTÊN SOSYALÎST Û GRUBA CEBARÊ EWÎNÎ RE PÎROZ BE.

# BEKÇÎ


Hê Cunta Faşîst ne hatibû ser iqtîdarê, hinek grub militanê xwe dişandin Filistînê an Lubnanê jibo xebata şoreşgerî. Rojekê dîsa neh-deh heb genç gihîştibûn hevdû jibo ji sînor derbas bibin. Dema ku diçûn leqayî bekçiyekî bûn. Bekçî li firfîrîka xwe xist û gote bisekinin! ...

Xortek ji nav xortan vegeriya û ji bekçî re got: "Apê bekçî emê herin ji xwe re soberiyê bikin."
Bekçî: Nah! Asaq e. (Yasaktir)
Xort:Dinya ger me emê xwe di avê da kin û vegerin.
Bekçî:Nah! Asaq e.
Xort : Gelî hevala de bidne pêş herin. Li vî kerî mêze nekin. Ev ji gotina xweş fam nake.

Bekçî pir aciz bû û bi Tirkiya xwe ya tevlihev dest pêkir.
-Êma siz ne olmiş mî? Siz Dengiz Gezmiş mî olmiş mî? Siz yisif Aslan mî olmiş mî? Siz ne olmiş mî?

Ê babo qêy siz Ingliz Firfirik oquyo, Qrêl Marqiz oquyo. Ma siz ne olmiş mî? Asaq, asaq e.

Bela ku ew dem pir rehet bû, xorta ji hev re gotin "Dev ji hewte-hewta wî berdin"û di reya xwe de meşîyan sinorê derbas bûn çûn.







www.arsivakurdi.org

SAUL STEINBERG


1914'de li Romanyayê hat dinyê. Karîkaturîstekî pir bi nav û deng e. Anaha li USA yê dijî. Emê ji karîkaturên wî hineka pêşkêşî we bikin.


HARB







XEWNA KÛBÊ





PISÎK



SURETÊ PASPORTÊ

www.arsivakurdi.org

# ÇALIM ŞEWQÎ




Ên ku bersîva me ÎSOTÇIYA ne xwen diye, bira ji kerema xwe re li hejmara 3'yan rû pela 14'an binerin û paşê zirtûfortê xwe bidomînin.

Bi hawakî din, he diya bersîva me 10 kronê Swêdiye.

LENGUSTÎK
(LINGUISTIQUE)

Ma Remo ji min re gotibû ku ew lengustîk dixwîne, ge lo rast e?
- Bise bidim bîra xwe! Haa raste.He valê diya sambuya (keçika ku pê re dimîne -kebaniya bêmar-) lengustîk dixwîne û yek car na dihat mala wan. Loma jî meriv kare bibêje ku Remo jî lengustîkê dixwîne.

# MIRINA ME BI XWE JÎ CUDA CUDA YE.





XWEŞ NEBÛNA ERMENISTAN

Silo çûbû Ermenîstanê ba merivên xwe ku hal û xatirên wan bipirse.

Di vegera xwe de gundiyên Silo jê pirsin:
-Silo lawo Ermenîstan çewa ye, xweş e an na?
Silo got: Weleh ku hun ji min bipirsin min tu xweşî di Ermenîstan de nedît.
Ciyê ku meriv serê sibê bi derketina rojê re, ne dengê zirîna keran û ne jî azana melan bibihîze, de ka we çi xweşbûna wê hebe!...





www.arsivakurdi.org

# CEMATXANE




Em cemaetek pêşverû u sosyalîst û komunîst in. Gerek em pêşkêşiya gelê xwe di her halî de bikin û em dikin jî.


Xebata me ya mezin ewe ku di şîn û şahiya xelqê me de em rehberê wan bin.

● Lê em naçin şeva Newrozê. Wek hun jî dizanin sê-çar kes hatine cem hevdû ku kes nizanin çine, navê xwe danîne komelên komunan an federasyona komunan. Rabûne bêy cemaeta me Newrozê pîroz dikin. Dibêjin qêy emê bidin dû wan çapûlciyan. Karê me bi çapûlciyan re tûneye. Em cemeatek xurt in. Gerek ew bidin dû me. Eger ew nedin dû me a baş ew e ku em li mala xwe Newroza xwe pîroz kin.

● Ji xwe kes nizane jin an mêr in. Van kesê por direj û aqil kin bi hevdû girtine tişta tevlîhev dikin. Bi aqlê xwe dixwazin temsîliya jinên meyî bindest ên çîlekeş bikin. Ew li ku ev karê mezinî giran li ku? Jinên Kurdîstanê, ancax û ancax cemeatek wek cemeata me kare temsîl bike. Ji ber vê yekê nehewce ye ku kes here şeva jinan. Emê li mala xwebi jinkê xwe re şeva jinan pîroz bikin.

● Ew grûbên ku belavok bela kirine jibo 12 Eylulê ne tu grûben sosyalîst in. (Belkî di nav wan de se-çar heb demoqrat hebin. Le ew jî wek me got belkî ye).Ew nikarin ciyê cemeatek sosyalîst bigrin. Em bi wan re nameşin û ji prensîbên xwe ên sosyalîst nayên xwarê. Emê ji devlê ve telgrafa bikşînin ji Ewrenê faşîst û rejîma wî, bi dil û can mahkûm bikin.

Xwendevanên ku duxwazin nivîs û karîkaturên xwe di ÎSOT'ê de çap bikin, bira ji kerema xwe re bişînin navnîşana ÎSOT'e.




www.arsivakurd.org

# QEHREMANÊ BÊ NAV



MAM Û DENGÊ "TIRK KEBABÎ" DI EWRUPAYÊ RE DERKET !..




www.arsivakurdi.org

UTGIVARE : KURDISKA DEMOKRATISKA ARBETARUNIONEN
REDAKTÖR & ANSVARIG : MAMOSTE
ADRES : Co/ AXBYPLAN 5 163 73 SPÅNGA
TFN: 08/760 81 23 POSTGIRO: 496 09 75-6
PRIS : 10 Skr, 10 Ff, 3 DM. PRENUMERATION 70 Skr
ISSN: 0283-099X

© MaMoste